
# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (258):

## Kuştina sivîlekî, ziwabûna Çemê Efrînê, girtinine bêsûcane, berdewamkirina tetrîkirinê, lêxistina sivîlina û gefkirina bi kuştinê, dizînek ji temenmezinekê û ferzkirina vêrgiyan

















إعادة افتتاح فرع معهد "يونس إمره" التركي في مدينة عفرين، مباني قسم "الحدادة والميكانيك" بالمدرسة الصناعية- حي المحمودية
30 آب 2023م


مباني قسم "الحدادة والميكانيك" - المدرسة الصناعية السابقة في عفرين، "معهد يونس امره"



افتتاح مركز "يونس أمره" الثقافي التركي في مدينة عفرين، ٢٠٢١/٩/٢٢م.

Destlatên Dagîrkeriya Turkiyê nêta xwe ji bo tetrîkirina Bakurê Sûriyê (belavkirina Ziman û Çanda Turkî di nav hemî pêkhate û çînatên civakên xwecihî de û bi hemî şêweyan, û bi taybetî di nav zarokan de) venaşêre; "Şeref Etîş" Serokê Amojgeha "Yûnês Emre" di gotina xwe de -li dema vekirina şaxa amojgehê li Bajarê Babê, li 25.8.2023an. Z- "kampaniyeke nû ji bo hînkirina zimanê Turkî ji/300/ hezar zarok re û tevlêbûna wan di Çanda Turkî de" aşkere kir, û got "me dest bi kampaniyeke Turkî li tevahiya çarçewa herêmê kiriye"; Nemaze ku wan li vê dawiyê sê şaxên nû li (Bab, Ezaz û Efrînê) ji amojgehê re vekirin.

**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Kuştina sivîlekî:**

Piştî ku perçehesinin li şeva 22.08.2023an. Z lêketin, di encama pevçûnên di navêna Artêşa Turkiyê û milîseyên wê de ji alîkî ve, û Artêşa Sûrî û hevalbendên wê ji alîkî din ve, li ser herdu aliyên xêza hevgîhanê li Çiyayê Lêlûn, û ketina avêjtekekê di orta mala wî de li Bajaroka "Xezîwê" - Şêrewa, û mandina wî çend rojan di Nexweşxana "Ibin Sîna" de li Bajarê Efrînê, li 28.8.2023an. Z, Hemwelatî "**Ibrahîm Elî Elî/Biro Şêrewî** /55/sal" (ji kok ve ji xelkê Gundê "Kibêşînê" - Şêrewa) ji ber birînên xwe yên kûr jiyana xwe ji dest da.

**= Ziwabûna Çemê Efrînê:**

Çemê Efrînê di rewşeke pir ne baş re derbas dibe ( bi rengê tu cara weha nebûye - ziyabûna nêzîkî tewawbûnê), ji piştî Benda "**Bircebdalo**" ya kombûniyê de bigir ta Gundê "**Milexelîla**" li ser Sînorê Turkiyê li aliyê Rojava(bi dirêjahiya dora /35/KM), û tibaba ava pir kêm ku digihêje bendê jî, bi şîretdayîn berdidin coyeke avdanê û Milîseyên "Firqit El'hemze" û hin din wê kontirol dikin û pê erdên desteserkirî û yên ji aliyê wan ve kirêkirî av didin; Û wê rewşê ziyanin mezin encam dan, him ji aliyê daketina berhemên çandiniyê ve û him jî hişkbûna beşekî ji zeviyên meywan, û ji ber bilindbûna lêçûna avdanê ji bîrên irtiwazî, 90% jê (ji yên nêzîk rûyê erdê jî) hişk bûne, vêca piraniya cotariyan neçar bûn ku "bîrên deryayî" bi kûraniya bêtirî /350/M bikolin.

Rast e ku radeya ava binerd daketiye, û tibabên baranê jî kêm bûne, lê Destlatên Turkiyê jî di ber rewşa pîs de berpirsiyar in, çimkî ji alîkî ve wan çar bend li ser avên ku tên ser Çemê Efrînê li hundir erdê xwe ("**Benda Mûsabîlî**" li sala 2018an. Z hate vekirin, "**Benda Efrîna Jor**" li sala 2021an. Z hate vekirin, **bendeke komkirinê** li ser şaxeke avên tên ser Çemê Efrînê, **bendeke komkirinê** li ser Çemê "Sabûnsiyê") ava kirine, û ji ber wê tibaba ava ku dikeve hewzoya **Benda Meydankê/Benda 17 Nîsanê** kêm bû; Û ji alîkî din ve jî **hevrêzkarê Turkî** (yê ku serpereştiya bendê dike) li navboriya hersê Zivistanên piştî vekirina Benda "Rîhaniyê/Hetayê" (cîgeha ku Çemê Efrînê boşê dibe, û /900/milyon mitir kabok dadigre) li Cotmeha 2020an. Z, bi rengekî fazle ava "Benda Meydankê" berda, û îsal jî bi behaneya erdheja /6/ê Reşmehê, da ku wê bendê tijî bike.

Li gor jêdereke taybet, girseya dagirtina sazûmane û normal a Benda Meydankê (190 milyon mitir kabok e) dema ku rêjeya bendê /335/M be, û girseya dagirtinê ya mirî (12.5 milyon mitir kabok e) dema ku rêjeya bendê /298/M be, lê rêjeya niha /322/M ye, û rêjeya nizim ji karkirina bendê re /320/M e.

Û tibabine mezin ji avê li arê jî derin, bi sedema tunebûna çaksazkirinê ji toreyên lûle û coyên avdanê û amûrên wê re (yên rastî dizînê û xirakirinê hatine), û herweha tunebûna rêvebiriyeke pispor ji serpereştiya pirojeyên avdanê re.

Weha jî stasyûnên avdanê (**Gemrûkê, Tiltewîlê/Astêr, Cûmkê û Bablîtê**) li derveyî xizmetguzariyê ne, û bi sedema dizînê tenê jê avahiyên vala mane; Lê Stasyûna "Bircebdalo" di saline berê de, li ser hesabê xelkên gund û derdorê hate amedekirin û bikaranîn, lê îsal -weke ku sekinî be- pir kêm bi kar hat, û bê ku destlatên dagîrker pêşxeriyekê bikin, da ku ji nû ve binevahiyên Benda Meydankê û çêgehên avdanê yên ku ziyan dîtine û wenda bûne damezrînin.

Divê were bîranîn ku "Encûmena Xwecihî li Efrînê", li 28.8.2023an. Z, di rûpela xwe ya Fêsbokê de ragîhand, ku "kontirola çandiniyê" hejmarek cotariyên ku bi pirograma ava avdanê pabend nekirine ceza kirin, û jêdereke xwecihî tekez kir, ku wê li ser her yekî ji van (**Xelîl Derwîş, Cîhad Hesen, Fadî Hesen, Hesen Nebî Eynat**" ji xelkê G. "Bircebdalo" - Şêrewa /2/hezar pereyên Turk ferz/ceza kir, bi sedema kişandina wan ji ava coyê re ji bo avdana zeviyên xwe; Di heman dema ku milîs jî piroseyên avdanê ji xwe re kontirol dikin.

**= Girtinine bêsûcane:**

**-** Li destpêka Tebaxa borî, li ser riya vegerê ji penberiyê bo warên bav û kalan, Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Ezazê" Hemwelatî "**Derwîş Hebîb** /55/sal û hevjîna wî **Remziye Hisên Hebîb** /50/sal û zarokê wan **Dîwar** /14/sal, û negîhayî **Reşîd Nezmî Gulîn Hebîb** /16/sal" bi tuhmeta têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser(R.X) re girtin û radestî "Asayêşa Efrînê" kirin, û piştî ferzkirina vêrgiyeke diravî li ser herdiwan -piştî çar rojan- "**Remziyê**" berda, piştî du heftan negîhayî "**Reşîd**" û di dû re jî "**Dîwar**", û ta niha "Derwîş" bêsûcane bendkirî ye.

**-** Li 05.08.2023an. Z, Hemwelatî "**Mistefa Se'îd Tobal** /42/sal" ji xelkê Gundê "Bilêlko" - Navça Reco ji aliyê "Asayêşa Leşkerî li Reco" ve du rojan hate girtin, piştî vegera wî ji penaberiyê bo cî û warê xwe, û piştî ferzkirina sezayeke diravî jî li ser hate berdan.

**-** Li 26.08.2023an. Z, li ser riya vegerê ji penaberiyê bo cî û warên bav û kalan, Destlatên Dagîrkeriyê li Bajaroka "Mari'ê" Hemwelatî "**Melek Betal** /26/sal, **Narîman Ken'an** /24/sal" tevî zarokên wan girtin, û hevjînên wan "**Enwer Mihemed Elî Mislim** /32/sal, **Selah Elî Betal** /27/sal" -ên ku berê li gundê xwe "Maseka/N.Reco" rûniştî bûn- xwestin û ew jî girtin, bi ser ku wan belgeyên erêkirina "Asayêşa Leşkerî li Reco" yên vegera malbatên wan jî bi xwe re anîbûn, û paşê "Narîn" hevjîna "Selah" û zarok berdan, lê sisiyên din ta niha bêsûcane bendkirî ne.

**= Vekirina Amojgeha "Yûnês Emre":**

Di heman dema şahîneya Turkî bi "Roja Serfiraziya /30/ Tebaxê" de, şaxa Amojgeha "**Yûnês Emre**" (a ku berê jî -weke destpêkirin- li 22.09.2021an. Z vebibû) ji nû ve li Bajarê Efrînê hate vekirin; Di avahiyên beşê "hesinkarî û mîkanîkê" ji **Dibistana Pêşesaziyê** de - Taxa Mehmûdiyê (ya ku li navîna Avdara 2018an. Z hatiye armanckirin, milîseyan tevahiya amûr û alet û acet û heyînên wê dizîne, û ji nû ve hatiye çaksakirin û kiswetkirin, da ku li ser û di holên wê de jî ala Turkiyê bê hildan).

Û vekirin pêk hat, bi beşdariyeke Turkî ye fermî ("Şerîf Atîş" - serokê amojgehê, "Yûsêf Toran" - cîgirê Waliyê Hetayê, "Fikret Şîtak" - hevrêzkarê "herêma aram" li Sûriyê, "Mehmûd Cînar" - Rêvebirê/Emîdê Kolîja Perwerdeyê li Efrînê/Zanîngeha Xazî Entab, "Mûrad Kondakcî" - serkêşê Asayêşa Efrînê) û cîgirê serokê Encûmena Xwecihî li Efrînê û hin din, û herweha jî bi nuxumandineke ragîhandinî ye Turkî ye fere.

Bi bîr were jî ku amojgehê li sala 2009an. Z dest bi çalakiyên xwe kir, û dora/63/navdên wê li cîhanê hene.

**= Binpêkirinine din:**

**-** Li 22.08.2023an. Z, anîndeyekî ji Çiyayê El'zawiyê/Idlibê û ji çekdarên Milîseyên "Lîwa'i El'semerqend" ve nêzîk sixêf ji herdu biran "Hisên 42 sal û Dijwar Mihemed Mehmûd 35 sal/ Malbata Derec - xelkê

Bajaroka Kefirsefrê/ Navça Cundirêsê" re kirin û gefgur danê, û li dema devavêtina wan bi hev re di nav baxçê xeyaran ê wan hemwelatiyan de, hewildana lêxistina wan jî kir, û qurşînên jîndar jî di nav lingên wan re û bi jor ve avêtin, piştî daxwaza "Hisên" ji wî anîndeyî ku kon û toreya xwe ya awê çûkan ji nav bêxçe rake, ji ber ku ew ziyanê dighînin berhemê/mûsimê û karê jinên karker kend û asteng dikin, û herweha jî wî êriş bir ser mala wan û ew gef kirin; Vêca herdu bira neçar bûn ku giliyekî pêşkêşî ewlehiyeta "Semerqend" bikin, a ku ew qedexe kirin ku li ba asayêşa leşkerî giliyekî vekin, û soz da wan ku ewê wî dijkarî bide ber lêpirsînê û ceza bike, lê wê soza xwe bi cih nanî.

**-** Li vê dawiyê, Milîseyên "El'sultan Silêman Şah - El'emşat" li ser xelkê Gundê "Birka" - Navça Mabeta vêrgiyên têvel verz kirin, jê /50/Dolar Emrîkî li ser her dareke gûzê, /600/Dolar li ser zeviyên zeytûna yên du zaroyên Malbata "Mistankî" yên ne li gund, û weha jî li ser werza/mûsima simaqê û yên din.

**-** Li şeva Çarşemê 30.08.2023an. Z, çekdarin derbas mala jina temenmezin "**Eyşe ya heftêsalî û jinebiya Dilovanber Bekir Yûsêf Şaşo**" bûn, li Gundê "Dargirê" - N. Mabeta, û piştî ku şênbereke hişbirinê danê, mal serbinqotî hev kirin û tiştê bi wan hêsan dizîn, bê ku jina temenmezin wêribe tiştên jê hatine dizîn hewalde yan jî giliyekî pêşkêş bike, ji tirsa cezakirineke bi hêztir re, û Milîseyên "Firqit El'hemze" jî (yên gund desteser dikin) tu tişt nelivandin.

Em dipirsin, çawa dewletek li ser herêmeke dewleteke din û bê erêkirina hikometa wê ya fermî çand û zimanê xwe bi rengekî fere ferz û belav dike, di riya çalakiyên cûrbecûr û pir re, û bi nixumandineke serweriyane ye fermî, û şerê ziman û çanda nişteciyên wê yên resen dike (nimûne hebûna Turkiyê li Bakurê Sûriyê)... Û ji aliyê "Civaka Navdewletî" ve bi **dewleteke dagîrker** nayê navdan?

03.09.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Pakrewanê sivîl "Îbrahîm Elî Elî".
- Ziwabûna Çemê Efrînê, Ajansa "Nors Pirês" 17.8.2023. Z.
- Çar bendên Turkiyê li ser Çemê Efrînê û avên tevlê dibin, hewzoya ku avê dide Benda Meydankê.
- "Nivîsgeha kontirolkirinê ya Encûmena Xwecihî li Efrînê" hejmarek cotariyên Gundê "Bircebdalo" - Şêrewa ceza dike, 28.08.2023. Z.
- Daketinek -cara nebûye- ji asta ava benda G. "Bircebdalo" ya komkirî û coya avdanê ya tek û tenê, 28.8.2023. Z.
- Şaxa Amojgeha "Yûnês Emre", avahiyên beşê "hesinkarî û mîkanîkê" - Dibistana Pêşesaziyê li Taxa Mehmûdiyê.